

NÛSIYA XWENDEKARAN ?!

Anahîte Mûrad

Li pir dever û warên cîhanê yên şaristane, wan ji zû ve nîrxê hiş û ramanên mirov di pêvajoka jiyanê de, nemaze di warê xwendin û zanîne de nas kirine, herweha jî, berên xwe dane demiqurasî, wekhevî û dadmendiye, bê astengî rê li pêş xwendekar û ciwanên xwe dîz û hêsan kirine. Wisan jî xwendekar li gora merem û meraqên xwe beşê ku, dikare tê de bi serkeve hildibjêre û xwendina xwe dajo serî û kuta dike; Ne jî li gora berhemên ezmûnan û mercên zor dijiwar?!. Vêca jî, ma kî nizane ku ew reng civakan îro di hemû warên jiyanê de li pêş in, çi aborî, konevanî, çandî, civakî û H.W.D be. Ji ber ku hemiwelatîyên wan dewletan hestên rêzgirtinê di hundirê xwe de bilind û bilind dibînin. Lê mixabin û, li vî welatî, rewşa xwendekaran di merc û hoyên zor dijiwar de li ber xwe dide, riya xwendin û dibistanan li pêş xwendekar bûye deriyê dijîtî, biv û nakokîyan ji ber xem, qisawet û astengên bi lodan, hêmenî û hevpîvanê di hundirê xwendekarên me de nîne. Lewre jî, ji berî çûna ev ton ezmûnên xwekuj xwendekarê reben, di heyameke netundiristî de gêjo-mêjo dimîne, ramanên reş û pir bi biv xwe li wî dipêçin ku, eger ew di vê ezmûna kirêt de bi ser nekeve û pileyeke bilind û berbiçav wernegire, wê bêgûman li mata reş bimîne û tu carî nikare di zanîngehên Sûriyê de cî bigire. Ango cefa û keda evqas sal bin pê dibe. Û bi ser ev rewşa wî ya ne tendurist, dema xwendekar dikeve talarê (qae) û dest bi ezmûnan dike, li hin deveran nemaze li bajarê Heleb beşek ji kesên çavdêran bi sitîlekî dîrî sincên mirovane, di bin perda (teşdîd û xişê) de H.W.D têra xwe terorê li serê xwendekaran dikin?. Mixabin li deverên dî jî, di hundir talarê de serbestî û azadî

çêdibe ! Loman jî, beşek ji xwendekaran bi girî, şîn û melûlî ji talarê derdikevin duhatî û çarenûsiya xwe reş û bê sîd dibînin, encama vê yekê çî li vir û çî li wir pir bûyer û serpêhtî bi êş û jan wek : Xwekujî, bazdana ji malê, nesaxî (dînbûn) li guhên mirov dikevin!. Îsal jî bûyerên ji vê rengî pir balkêş û bi jan weke nimûne : Di rojinama welatê me (Beledine) de ya rojane hejmar -979-rûpel (6) ku , keçeke xwendekar ji berî ezmûnan bi çend rojan di bin bandora hestê tirsê de ku eger ew di reng ezmûn de bi serneke ve wê rû reş û bêçare bimîne .Wisan jî, xwe dikeve !?. Ma gelo ev ton rewşa di warê xwendin û zanîngehan de li tu deveran ji bilî vê welatî hene. Ma çêdibe ku sînor, asteng û mercên giran ne li gor pêvajoka demê be, di riya ciwan û nîfşên nûgiha de hebin. Ta kengê gelê Sûriyê wê di vê rewşa kambax û wêran de bimîne?. Ev li hêlekê û li hêla dî, di rojaveke weha de bi ser derd û kulan de gelo ew rewşa xwendiyên xwendekar wê çî be û çawa be?. Li gel rewşa bihabûna her tiştî ku piştî xelkê şikestî, piraniyên mirovên Sûriyê qisawet û xemxarên pariyê nanê zariyan û nemaze Kurdên me yên ku di bin nîrê zor û cudahiyê de li ber xwe didin. Ligel wê jî, berên zariyên xwe didine dibistan û korsan ta ku, ew di xwendina xwe de biserkevin û duhatiyeke xweş û geş ji wan re ava bikin. Lê piştî, evqas kefteleft, hêvî û armancên piraniyên ji wan bi mate, pêjin û xewinan re dicirifin û bêtirî ciwanên xwe bi keser û êş dimînin ?!.Loman jî zor pêwîste ku şalyariya perwerdeyê li xwe vegere û ev pîrsgirêkên di warên dibistan û zanîngehên Sûriya me de çareser bikin û li gora demê bimeşin ta hemwelatîyên Sûriyê jî weke hemwelatîyên xelkê dinyayê di heyameke demiqurasî, wekhevî û dadmendiye de zar û zêçin xwe perwede bikin. Bi vî awî Sûriya me wê bibe simbola aşî û xweşiyê , ne wilo ye?!